

LI DOR ZAYEND Ê NETEWE(TÎ)YÊ JINA KURD DI BERHEMÊN ELİYÊ EVDILREHMANÎ DA

CİNSİYET VE MİLLET/MİLLİYETÇİLİK BAĞLAMINDA ELİYÊ EVDILREHMAN'IN
ESERLERİNDE KÜRT KADINI

KURDISH WOMEN IN THE WORKS OF ELİYÊ EVDILREHMAN IN THE CONTEXT OF
GENDER AND NATION(ALİSM)

Güneş KAN*

Kurte

Netewe(tî) qadeke mêrane ye û xwe dispêre “yekîtiya birayan”. Tevî vê, beşdariyeke giring a jinê heye di projeyên neteweyî da. Çi bi beşdariya çalak çi bi beşdariya çandî û îdeolojîk jin di îna, xurtkirin û berdewamiya netewe(tî)yê da roleke giring digire. Jin, ji ber vê bal û meraqa gotara neteweyî dikişîne ser xwe û dibe mijareke wê ya jêner. Ev rewş bi heman rengî di berhemên Eliyê Evdilrehmanî da jî tê dîtin. Di vê çarçoveyê da ji bo piştrastkirina vê îdiayê sê berhemên Evdilrehmanî yên bi navên *Xatê Xanim*, *Şer Li Çiya*, *Gundê Mêrxasan* hatine vekolan ku tê da nivîskar hewl daye nasnameyeke neteweyî çêbike û xwînerên xwe bi hişmendiyêke kurdperwer dorpêç bike. Di encamê da hate dîtin ku nivîskarî jina kurd bi rol û taybetmendiyên ciyawaz wek temsîleke neteweyî derxistiye pêş. Nivîskarî jina kurd bi rolên wek desthilatdar, pêşeng, şervan, berxwedêr, şewirmenda mêrî, hilgira biyolojîk, hilgira çand û namûsê karakterize kiriye û ew bi taybetmendiyên wek xurt, azad, aqilmend, pêşbîn îdealîze kiriye. Nivîskarî, zêde pesn û payên jina kurd daye, lêbelê ev bi zimanekî zayendparêz û li jinê barkirina tevger û xesletên mêr(ane) kiriye. Loma di berhemên vekolandî da berzûbalakirina jina kurd bi awayekî îronîk û paradoksî bûye sedema veafirandina pederşahiye.

Bêjeyên Sereke: Zayend, Netewe(tî), Eliyê Evdilrehman, Jina Kurd, Texeyul.

Öz

Milliyetçilik eril bir alan olup “erkek kardeşler birliği”ne dayanmaktadır. Bununla birlikte milli projelerde kadının önemli bir katılımı söz konusudur. Kadın gerek aktif katılım gerekse de kültürel ve ideolojik katılımıla millet ve milliyetçiliğin inşası, güçlendirilmesi ve devamlılığında önemli bir rol oynamaktadır. Bu yüzden kadın, milli hareket ve söylemlerin ilgisini çekip millet ve milliyetçiliğin vazgeçilmez konusu olmaktadır. Bu durum aynı şekilde Eliyê Evdilrehman'ın eserlerinde de görülmektedir. Bu çerçevede bu iddiayı doğrulamak için Eliyê Evdilrehman'ın milliyetçi söylemlerle milli bir kimlik oluşturup okurunu Kürtçü bir bilinçle donatma çabasında olduğu *Xatê Xanim*, *Şer Li Çiya*, *Gundê Mêrxasan* isimli üç eseri incelenmiştir. Sonuç olarak görüldü ki yazar Kürt kadını farklı rol ve özellikleriyle milli bir temsil olarak sunmuştur. Yazar, Kürt kadını; iktidar sahibi, lider, savaşçı, direnişçi, erkeğin danışmanı, biyolojik taşıyıcı, kültür ve namusun taşıyıcısı gibi rollerle karakterize edip güçlü, özgür, akıllı, öngörülü gibi özellikleriyle idealize etmiştir. Yazar, Kürt kadını ziyadesiyle yüceltmıştır, ancak bunu cinsiyetçi bir dil kullanmak ve erkek(si) davranış ve özellikleri kadına yüklemek suretiyle yapmıştır. Dolayısıyla incelenen eserlerde Kürt kadınının yüceltilmesi ironik ve paradoksal bir biçimde ataerkilliğin yeniden üretimine hizmet etmiştir.

Anahtar Kelimeler: Cinsiyet, Millet/Milliyetçilik, Eliyê Evdilrehman, Kürt Kadını, Tahayyül.

Abstract

* Dr. Vekeler, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, E-posta: rojxun@hotmail.com, ORCID: <https://orcid.org/0000-0002-7097-6047>.

Nationalism is a masculine field and is based on “the unity of brothers”. However, there is an important participation of women in national projects. Women play an important role in the construction, strengthening and continuity of nationalism, both through active participation and through cultural and ideological involvement. Therefore, women attract the attention of national movements and discourses and become an indispensable subject of nationalism. This situation is also seen in the works of Eliyê Evdilrehman. In this context, in order to verify this claim, three works of Eliyê Evdilrehman, named *Xatê Xanim*, *Şer Li Çîya*, *Gundê Mêrxasan*, in which he tries to create a national identity with nationalist discourse and equip his readers with a Kurdish consciousness, have been examined. As a result, it was seen that the author presented the Kurdish woman as a national representation with her different roles and characteristics. The author characterises Kurdish women as rulers, leaders, warriors, resisters, advisors to men, biological carriers, carriers of culture and honour and idealises them as strong, free, intelligent and visionary. The author has glorified the Kurdish woman greatly, but he has done so by using sexist language and attributing masculine behavior and characteristics to women. Therefore, ironically and paradoxically, the glorification of Kurdish women in the works studied served to reproduce the patriarchy embedded in the Kurdish language and society. **Keyword:** Gender, Nation(alism), Eliyê Evdilrehman, Kurdish Woman, Imagination.

DESTPÊK

Nîqaşên di derbarê zayendê da bi giştî di derbarê jin û zayenda civakî da ne. Jin û mêr di civakê da statuyên xwe yên cuda hene, ji ber vê jî berjewendiyên wan cuda ne (Walby, 2016, r. 57). Ne bi tenê berjewendiyên wan, rol û berpirsiyarên wan ên civakî û neteweyî jî ne wek hev in. Projeyên neteweyî, bi awayên cuda karîgeriyê li ser jin û mêran dihêlin û bi awayên cuda bala wan dikişînin (Walby, 2016, r. 41). Ji ber vê jin û mêr bi awayên cîyawaz beşdarî pêvajoyê û projeyên neteweyî dibin. Hin vekoler neteweyê bi piranî wek “yekîtiyeke birayan” dinirxînin (Najmabadi, 2016, r. 131). Lewre siyaseta netewe(tî)yê bi piranî li ser tecrubeyên meran ava dibe. Lewra dikare bê gotin netewetî, “Bi giştî ji hiş û bîreke maskulînîzekirî (nêrkirî), biçûkxistineke maskulînîzekirî û hêviyeke maskulînîzekirî derçû”ye (Enloe, 2003, r. 79).

Herçend siyaseta û bizavên netewetiyê, bi giştî xwedî rengûrûyekî mêrane be jî jin bi awayên cuda beşdarî projeyên neteweyî dibin. Li gor Anthias û Yuval-Davis jin dikarin bi pênc awayên sereke beşdarî pêvajoya projeyên neteweyî, etnîk û herweha dewletbûnê bibin:

- (a) Wek berhemînerên biyolojîk ên endamên komên etnîk,
- (b) Wek ve-berhemînerên sînorên normatîf ên komên etnîk û neteweyî,
- (c) Wek veguhêzera çandê û rolgirtineke navendî di ve-berhemanîna îdeolojîk a komê da,
- (d) Wek nîşaneyên cîyawaziyên etnîk/neteweyî -yanî wek nivend (focus) û sembolên di gotarên îdeolojîk da ku di înşa, ve-berhemanîna û veguherîna kategoriyên etnîk/neteweyî da tînan bikaranîn,
- (e) Wek beşdarên têkoşînên neteweyî, ekonomîk, polîtîk û leşkerî (1989, r. 7).

Ji salên 1960î û şûn da aîdiyet, hişmendî û hestên neteweyî di berhemên edebiyata kurdî ya Sovyetê da derdikevin pêş. Di berhemên Eliyê Evdilrehmanî -ku nivîskarekî edebiyata kurdî ya Sovyetê ye- da fikr û hesta netewetiyê tê çavdêrîkirin (Ergün, 2023, r. 101-133). Sedema dorpêçbûna berhemên nivîskarî bi hêmanên neteweyî, dikare bi cureya wan bê nixandî. Berhemên nivîskarî yên bi navên *Xatê Xanim* (1958), *Gundê Mêrxasan* (1968), *Şer Li Çîya* (1989), vegêranên edebî yên mijar-dîrokî ne û pevçûn û serhildanên kurdan ên neteweyî vedigêrin. Li aliyê din di berhemên nivîskarî da pesinandina sosyalîzm û propagandaya pergala Sovyetê jî tê ber çavan. Dikare bê îdiakirin, nivîskarî bi hewla çêkirina hevsengiyekê di navbera netewetî û sosyalîzmê da netewetiyê çepgir pêşkêş kiriye.

Afirandin û roldayîna karakterên jin di berhemên Evdilrehmanî da, dikare wek deravetiyêke polîtîkayên Sovyetê yên derbarê jinê û giringiya jinê di gotara netewetiyê da bê nixandî. Wekî

ku Millett (2011, r. 272-273) jî dibêje Yekîtiya Sovyetê pederşahî rexne dikir û dixwest wê bi dawî bike, herweha dixwest malbatê ji nû ve saz bike. Di vê çarçoveyê da li ser azadî û mafên jinê hate rawestandî. Bi qanûnan serdestiya mêran ji ser jinan hate rakirin, mafên jinê yên aborî, zayendî û civakî hate bicihkirin. Piştî şoreşê wek amraza estetîk a polîtîkayên Sovyetan realîzma sosyalîst jî ji nivîskaran dixwest karakterên jin di berhemên xwe da bi cih bikin, wan wek qehreman sembolîze bikin û wan bikin rol-modelên civakê (Uygur, 2005, r. 6). Bicihbûna karakterên jin di berhemên nivîskarî da bi taybetmendiyên azad, wekheva mêran, xurt û îdealîzêbûyîna wan ji vî alî ve tesîra polîtîkayên Sovyetê yên zayendê û rêgezên realîzma sosyalîst destnîşan dike. Bi nêrîneke neteweyî texeyula jinê di berhemên nivîskarî da jî dikare bi girêdana zayend û netewe(tî)yê bê nîrxandin.

Di vê xebatê da dê li dor zayend û netewe(tî)yê texeyula jina kurd bê analîzkirin. Li dor têkiliya zayend û netewe(tî)yê em dê analîz û şîrove bikin ka di berhemên Eliyê Evdilrehmanî yên bi navên *Xatê Xanim*, *Şer Li Çîya*, *Gundê Mêrxasan* da jin çawa hatiye pêşkêşkirin û jina kurd bi kîjan taybetmendiyên bûye perçeyekî texeyula neteweyî.

1. Jina Kurd Wek Desthilatdar û Pêşenga Neteweyê: “Dayika Neteweyê”

Di *Xatê Xanima* Eliyê Evdilrehmanî da jin wek serlehenga berhemê derketiye pêş û navê xwe daye berhemê. Di berhemê da serokeşîrê kurdan, Têmûr Eliyê Îsa dimire û kurê wî, Sultan di şûna wî da rûdine. Rêvebirên dewletê piştî mirina Têmûrî baca li ser eşîrên kurdan zêde dikin. Sultan diçe Ezîrganê û ji milazim hêvî dike ku bacên li ser gel sivik bike. Lêbelê milazim wî diavêje girtîgehê û dûre cezayê îdamê didinê. Piştî girtina Sultên cara duyem eşîrên kurdan bêpêşeng dibin. Îcar dora serokeşîriyê dibe ya Xatê Xanimê. Wek serokeşîr Xatê Xanim tevî eşîrên girêdayî xwe ji bo berdana kurê xwe dixebite. Di berhemê da nivîskarî girtina Sultên, li ser bacan nelihevkirina Sultên û rêvebirên dewletê –ku meseleyeke sosyo-ekonomîk û herêmî ye- û hewildanên Xatê Xanimê yên bo berdana kurê xwe kiriye çarçoveya meseleyeke neteweyî û xwestiye li ser wê nasnameyêke neteweyî ava bike (bnr. Sayım, 2020, r. 112; Ölmez, 2018, r. 61-62). Li ser vê bingehe nivîskarî kurd û tirk wek du nasnameyên neteweyî yên dijber ên nelihev raxistiye ber çavan. Heta dawiya berhemê bendewariyek di xwîner da çêdibe ku şerekî giran di nava her du neteweyan da derkeve. Lêbelê ji ber zîrekî, jêhatîbûn û rêzanîna Xatê Xanimê şerekî şênber dernakeve û Sultan tê berdana. Di çarçoveya mijara berhemê da li ser têkilî û ciyawaziyên neteweyî yên tirk û kurdan nivîskarî di şexsiyeta Xatê Xanimê da tîpolojîyêke zayend-neteweyî ya jina kurd çêkiriye. Xatê Xanim wek jineke desthilatdar, pêşeng, dilpola, azad, xurt, qehreman, rêzan, wêrek, berxwedêr, aqilmend teswîr kiriye.

Di karakterîzasyona Xatê Xanimê da taybetmendîya herî balkêş, desthilatdarî, pêşengiya cîmaetê û taybetmendiyên li dor wê şewegirtî ne. Xatê Xanim wek serokeşîr eşîran bi rê ve dibe, li hember dijmin –rom- yekîtiya eşîrên kurdan saz dike. Ji aliyekî ve ji bo çareya dawîn mîna qumandarekê hemû eşîrên kurdan ji bo şerekî giran organîze dike, ji aliyê din ve bi aqilmendîya polîtîk ji bo çareserkirineke bêşer hewil dide. Nivîskarî di şexsiyeta Xatê Xanimê da jina kurd wek hikumdareke xwedî feraseta polîtîk û leşkerî derxistiye pêş.

Dikare bê gotin Evdilrehmanî, di çêkirina karaktera Xatê Xanimê da ji taybetmendiyên jinên kurd ên pêşeng, ên wek Adîle Xanim, Fatîma Xanima Reş, Pêrîxan Xanim, Şemsî Xanim, Fasla Xanim sûdewar bûye. Li gor van Bruinessen jinên navborî –ji bilî Adîle Xanimê- encax piştî mirina mêrên xwe bûne pêşengên siyasî û civakî. Di mînaka Xatê Xanimê da jî heman rewş tê dîtîn, ew piştî mirina mêrê xwe û derdestkirina kurê xwe dibe serokeşîr. Hem mînakên dîrokî hem lehenga Xatê Xanimê jî destnîşan dike ku di dîroka kurdan da jin encax ji xwedêdanê yan jî bi rêya zewacê hatiye mercên bilind û hingê zayend êdî ji bo wê nebûye asteng. Jina li jor pîramîda civakî karîbûye bi kesayet û xurtbûna xwe têkeve pêşîya mêran û mêrên kurd serdestiya jineke weha wek rewşeke hetîketî hesab nekin. Mensûbiyeta malbateke elît jixweber ew jin derxistiye merceke bilind, maf û rûmet kiriye para wê û ew ji cezayên zayendî muaf kiriye (2013, r. 140-141). Li aliyê din gelek balkêş e ku hem jinên kurd ên pêşeng ên dîrokî û hem Xatê Xanim wek berdêla gihaştina mercên bilind û muafiyeta ji astengî û cezayên zayendî ji taybetmendiyên jinan(e) feraxet kirine, bûne wek mêran. Ew çawa li textên mêran rûniştine, herweha taybetmendiyên mêran li xwe kirine, rolên wan girtine ser xwe. Lewma jî di şexsiyeta Xatê Xanimê da temsîla jina kurd a pêşeng, xurt, azad ji temsîleke femînen gelek dûr e û temsîleke deynkirî ya mêran(e) ye. Ew şûngira mêr e û loma -wek mêran- dilpola ye. Pêşaniya wê ne kurê wê ye, xêr û aramiya cîmaetê ye. Wekî Kandiyoti amaje pê kiriye feraxeta jinê ji taybetmendiyên jinan(e) ji bo statuyeke bilind, dikare bi hişkiya pênaseyên çandî yên derbarê jinbûnê bê şîrovekirin (2013, r. 84).

Di *Xatê Xanimê* da Evdilrehmanî roleke mezin daye karaktera xwe: “dayika neteweyê”. Xatê Xanim çawa diya Sultanî ye weha jî wek “dayika neteweyê” hatiye simbolîzekirin. Nivîskarî ev rola alegorîk li ser zîmanê cîmaetê bêtir berceste kiriye. Dema biryara îdamkirina Sultanî derdikeve, hemû eşîrên kurdan ên Dêrsîmê tîni di hizûra Xatê Xanimê da dicivin û bi yekdengî dibêjin: “Em ji îro de li hêviya emirê te ne û em ê rojê ji her êlekê merivekî bişînin hizûra te, te çawa emir da, em ê wisa jî biqedînin. Xatê Xanim, diya me!” (r. 53). Berçav e nivîskarî ji dayika biyolojîk zêdetir giringî li ser “dayika neteweyê” daniye. Dayika biyolojîk ji bo avakirin û bihêzkirina dayika simbolîk kiriye amraz. Lewre jî ji bo xurtkirina rola simbolîk a “dayika

neteweyê” taybetmendiye berçav ên dayika biyolojîk sist kirine û leheng ji hestên dayikê dûr xistiye. Xatê Xanim, li çareseriyên digere ji bo kurê xwe bêyî şer ji îdamê rizgar bike. Lê ew, ne bi hestên dayikekê, bi sebir, pêşbînî, xemsarî, mentiq û polîtîk tevdi gere da ku aramî û aştiya cimaetê xera nebe. Heta ji ber vê sekna wê cimaet diheyire û di seranserê berhemê da hevalnava “dîlpola” wek taybetmendiya wê ya sereke tê destnîşankirin. Ew bi hest û tevgerên mêran(e) hatiye xemilandin. Texeyuleke hevşib di romana nivîskarî ya *Şer Li Çîya* de jî tê ber çavan. Kurê Zelîxeyê, Memo, ji aliyê desteya Şêx Zayîrî ve tê dîlgirtin û kuştin. Qasidên walîtîyê dema agahiyê didin Zelîxeyê, ew ewladiya Memoyî red dike û nahêle ku Memo di gund da bê defînkirin. Zelîxe bi hestên dêtiyê tevnagere, şîna kurê xwe nake (r. 112-113). Ji ber ku Memo bi dîwana Romê ra hevalbendî kiriye û zilm li gel kiriye ji aliyê neteweya xwe û herweha dayika xwe ve tê redkirin. Nivîskarî di şexsiyeta Zelîxeyê da hestên neteweyî kirine pêşiya hestên dêtiyê. Tîpolojîya jineke neteweperwer a îdeal afirandiye û ew kiriye nimûneyeke herî berçav bo helwesta berzûbalakirina netewetiyê. Zelîxeyê ji bo lixwedîderketina neteweya xwe kurê xwe red û înkâr kiriye. Bi gotineke din di şûna berevaniya kurê xwe yê biyolojîk da berevaniya neteweyê kiriye, di şûna dayika kurekî kurdfiroş da bûye “dayika neteweyê”.

Di vegêrana netewetiyê da bi piranî ji jinê ra rola dêtiyê hatiye tayînkirin, jin bûye temsîlkera “hêlîna neteweyê” (Nagel, 2016, r. 86). Ji xeynî zarokanîne hin taybetmendiye din ên dayikê di texeyulên neteweperweriyê da hatine bikaranîn. Bo nimûne, netewe, netewe-dewlet wek dayikeke hewcedarî parastinê hatiye sêwirîn (Saigol, 2016, r. 231-232). Welat wek dayik û bedeneke bi nexweşiyê giran ketî, qels û bêhal hatiye teswîrkirin (Najmabadi, 2016, r. 154). Ev mecaza dayikê bi giştî ji bo “hişyarkirin û jixewrakirin”ê hatiye bikaranîn. Sembolîzekirina welêt di şexsiyeta dayikeke nexweş da balê dikişîne ser zarokên wê -yanî endamên neteweyê- û peywîrên wan ên ji bo dayikê -yanî welêt-. Di gotarên netewe(tî)yê da bi giştî kurê dayikê ji bo berevaniya dayikê hatiye peywîrdarkirin. Divê kurê wê, dayikê ji halê xirab û mirinê rizgar bike. Li aliyê din di vegêranên netewetiyê da “dayik” kurên mêrxas tînin, ew dayikeke fedakar û biêş e, şhadeta kurê xwe bi aramî û serbilindiyê pêşwazî dike (Saigol, 2016, r. 237). Di çarçoveya şhadetê da mirov dikare analojîyekê di navbera axa welêt (gor/merzel) û hembêza dayikê da jî bike. Kurê şehîd, di axa welatê xwe da tê defînkirin ku mecazen hembêza dayikê ye. Li ber ronahiya van agahiyan em dibînin ku Xatê Xanim a dîlpola ji bo xweşiya kurên din ên neteweyê dikare kurê xwe yê heq feda bike û di axa welêt da defîn bike. Di mînaka Zelîxeyê da jî dayik, kurê xwe yê heq red û înkâr dike ji ber ku wî peywîrên neteweyî bi cih neanîne. Zelîxeyê nehiştiye kurê wê di gund da -di axa welêt da- bê defînkirin, bi gotineke din hembêza xwe ji kurê xwe hêvişandiye.

2. Jina Kurd Wek Hilgira Biyolojîk: “Dayika Zarokan”

Aîdiyeta jinan a bi neteweyê ra bi zewacê û xasma bi anîna zarokên lawîn çêdibe, jin encax hingê bi awayekî sembolîk dibin perçeyê yekîneya neteweyî. Jin bi anîna zarokên lawîn ên wêrek û jêhatî, ji nû ve ruh dide neteweyê. Kurên wê di şeran da wek leşkerên çalak, wêrek, canfeda axa welatî diparêzin, di aştiyê da wek xebatkarên jêhatî xizmeta neteweya xwe dikin. Di vê çarçoveyê da dayiktî di projeyên neteweyî da wek “xizmeteke neteweyî” tê dîtin û bi saya vê xizmetê dahatûya neteweyê tê dabînkirin (Saigol, 2016, r. 235-236). Ji ber vê bi taybetî di rewşên aloz da rengêkî polîtîk li dayiktî û zarokanîne tê barkirin.

Di berhemên Evdilrehmanî da berhemîneriya biyolojîk a jinê di çend mînakên da tê raçavkirin. Di *Xatê Xanimê* da Xatê Xanim berî her tiştî diya biyolojîk a kurekî -Sultan- ye ku ev yeka di projeyên netewe(tî)yê da amaje bi berdewamiya malbatê û jê wêdetir a neteweyê dike. Piştî mirina bavî Sultan dibe şûngirê wî û serkariyê li eşîrên kurdan dike. Dema ew tê derdestkirin çarenûsa neteweyê dikeve xetereyê, di wê navberê da Xatê Xanim bi serkeftî statuya wî bi deyn werdigire. Lê piştî berdanê ew dîsa li pêgeha pêşengiya neteweyî rûdine. Evdilrehmanî di hin mînakên din da rola dayika biyolojîk di netewe(tî)yê da û pêwendiya zarokê lawîn û berdewamiya neteweyê bêtir bi eşkereyî teswîr kiriye. Di *Şer Li Çiya* da piştî destpêka şerê desteya Şêx Zayîr bi romê ra, rayedarên dewletê ji bo ku Şêx Zayîrî derdest bikin planan dikin. Mesela eşîra kirîvê Şêx Zayîrî sirgûnê Îzmîrê dikin ku Zayîr bê hawara wan û têkeve kemînê. Di rêya sirgûnê da bûka Ebûbekîr li ber zarokanîne ye, lê efserê artêşê nahêle ku ew bi hemlê xwe zarok bîne. Dema sirgûnê digihîjin gundekî, şervanên kurd ji jor guleyan dibarînin. Efser bi metirsiyê hingê destûr dide ku bûk bi hemlê xwe zarokê xwe bîne dinyayê. Bûk kurekî tîne dinyayê û navê Sirgûn lê dikin (r. 124-126). Li aliyê din nivîskarî di prologa romanê da bi awayekî berfireh behsa jin û dota kurd kiriye, pesnê wê daye. Taybetmendî û rolên wê vegêrane û bi gotinên “[dikare] zarokan bîne û jîndariya kurdeyatîyê bîdomîne. Dikare ku weke mirovên cîhanê herî eyan jî bixulîqîne” (r. 23) bal kişandiye ser zarokanîne. Zarokanîn wek taybetmendî, peywîr yan jî xizmeteke neteweyî ya jina kurd destnîşan kiriye.

Di projeyên netewetiyê da anîna zarokên lawîn qîmeta jinê zêde dike. Ev xaleke temasê ye di navbera netewetî û pederşahiye da. Di civakên pederşahî da çawa zarokên lawîn wek dewamkerên silsileyê malbatê tên dîtin, di projeyên netewetiyê da jî wek dewamkerên neteweyê tên dîtin. Di vê çarçoveyê da di berhemên nivîskarî da texeyula malbatê û zayenda zarokên malbatê balkêş e. Di texeyula nivîskarî da malbatên kurdperwer her zarokên lawîn ên qehreman hene, malbatên bav-xayîn jî bi giştî xwedî ewladên qîz in. Bi vî rengî di berhemên nivîskarî da bi hebûna zarokên lawîn berdewamiya malbatên kurdperwer bi berdewamiya neteweyê ra

hatiye hevyeckirin. Piştî bavî dê kur wek garantor berdewamiya malbatê û herweha ya neteweyê dabîn bike. Digel vê di malbatên bav-netewefiroş da malbat di rewşeke perçebûyî da û li ber jiholêrabûnê ye. Nebûna zarokên lawîn di malbatên nekurdperwer da bidawîbûna wan a jixweber îma dike. Li aliyê din wek leîtmotîfêkê di hemû berhemên nivîskarî da qîzên malbatên bavxayîn gelek welatperwer û neteweperwer in. Ew bavên xwe red dikin û bi kurên malbatên îdeal ra dizewicin -Simbil bi Şêx Zayîrî ra, Xezal bi Qasimî ra û Zeynê bi Sultanî ra-. Bi vî rengî ew jî dê beşdarî anîna zarokên neteweperwer bibin. Digel karakterên xayîn ên mêr nivîskarî karakterên jin ên xayîn neafirandine. Hevjîn û qîzên mêrên nekurdperwer, bi taybetmendiyên aqilmend, xwedî hişmendiyeke neteweyî, gelhez afirandine.

3. Jina Kurd Wek Aqilmend, Pêşbîn, Neteweperwer û Şêwirmend: “Palpişt û Rêhevala Mêr”

Netewe di teorî û vegêranên edebî da bi piranî bi metaforên malbatê tê texeyulkirin (Najmabadi, 2016, r. 129) û malbat wek prototîpa neteweyê tê ber çavan. Projeyên netewe(tî)yê gelek giringiyê didin malbatê û hin berpirsiyarî û rolên diyar li endamên malbatê dabeş dibin. Di vê çarçoveyê da di her sê berhemên nivîskarî da malbateke kurdperwer hatiye texeyulkirin, hin taybetmendî û rolên diyar li dê û bavê malbatê hatine barkirin. Bo nimûne, bavên malbata kurdperwer di *Şer Li Çîya* û *Xatê Xanimê* da bi taybetmendiyên mêvanhez, pêbawer, merd, jîr, xwedîtecrube, birûmet, zana, navbeynkar, wêrek, adil û ji her tiştî giringtir kurdperwer hatine derpêşkirin. Xala herî berçav a bavê her du malbatan ew e ku hîn di zarokatiyê da nixrên kurdayetiyê hînî kurên xwe dikin, ji wan re dîrok û rewşa kurdan, dijminatî û zordariya dagirkerên kurdan vedigêrin. Kurên xwe bi hişmendiyeke neteweyî mezin dikin, şîretan li wan dikin ka dê çawa berevaniya neteweya xwe bikin (2011, r. 38-49; 2004, r. 15-16). Herweha di her du berhemên da statuya jinê jî di malbatê da wekhev e. Jina kurd wek hevjin û dayik di her du berhemên da bi rengdêrên kamil, aqilmend, rêhevala mêrê xwe, birêûrêbaz, zana, pêşbîn, bifesal û di heman demê da dilovan tê ber çavan. Diyar e nivîskarî di malbatên kurdperwer da rola perwerdekariyê daye bavî. Dayika malbatê jî bi rol û taybetmendiyên temamker, alîkar û şêwirmenda mêrî aniye pêş.

Di berhemên nivîskarî da yek ji rolên sereke ya jina kurd, şêwirmendî ye. Ew, bi giştî yan şêwirmenda mêr/hezkiriyê xwe yan ya kurê xwe ye. Di *Şer Li Çîya* da Şêx Emer, derbarê pêşeroja kurên xwe da bi tenê biryarê nade, fikrên Xezê Xanimê jî digire ber çavan. Di romanê da Xezê Xanim ne bi tenê derbarê pêşeroja kurên xwe da xwedî biryar e, herweha ew ji aboriya malbatê jî agahdar e û wek hesabdarekê hesaban dike. Rewşa aborî ya malbatê bi tenê rê dide xwendina kurekî. Şêx Emer ji her du kurên xwe dixwaze ku ew di nava xwe da biryarê bidin

ka dê kîjan biçe medreseyê. Tevî vê, fikrê Xezê Xanimê jî digire bi sedema ku ew dûre nebêje wan ew ber tişteki hesab nekiriye (r. 44-49). Herweha di heman romanê da Simbila yara Şêx Zayîr û keça Edo baweriya bavî bi xwe tîne ku tu tîkiliya wê bi Şêx Zayîr ra nîne û şixulên bavê xwe dipejirîne. Piştî bawerkirinê Edo wek hevkarê hikûmetê planên ji bo serkutkirina serhildana Şêx Zayîrî û tîkbirina desteya wî ji Simbilê ra vedigêre. Simbil jî ji aliyekî ve agahiyên wergirtî digihîne Şêx Zayîr, ji aliyê din ve ji bo gumana bavî biqedîne û baweriya wî qewîn bike kirinên Şêx Zayîrî û desteya wî reş dike. Bav, bi temamî ji keça xwe bawer dike û êdî her bi wê dişewire: “Niha keça min şewirdara min e, ew çî bibêje ez ji gotina wê dernayem” (r. 158). Li ser zimanê hevjinê Edo, Nûrê (Werdek) tê vegêran ku demekê şewra Edo di destê wê da bûye, berî her kirinekê pê dişewirî. Ji ber vê jî wê demê di nava “birayên xwe yên Kurd” da birûmet û rêzdar bûye. Lê niha bi dijminan ra hevkarîyê dike, ji ber helwest û kirinên wî yên nelirê kurd ji wî hez nakin û wî red dikin. Tê dîtin ku nivîskarî amaje bi rastbînî û pêşbîniya jinê kiriye ku tîkiliyên erênî ava dike di nava endamên neteweyê da û guhpênedana şîretên wê ji bo mêrî dibe sedema hin rewşên nexweş. Di mînakê da jî ji ber ku Edo êdî qet bi jina xwe naşewire û şîretên wê guhdar nake (r. 157-158) ji rê derketiye, kirinên li dijî neteweya xwe dike û neteweyê ew ji cimaeta xwe veder kiriye.

Dijberiya lehengên erênî û neyînî -ku rêgezeke berbelav a realîzma sosyalîst e- di berhemên Evdilrehmanî da li ser bingeha modela malbatê hatiye çêkirin. Li hemberî her malbateke kurdperwer a îdeal, modela malbateke neîdeal hatiye bicihkirin. Di malbatên neîdeal da, bavê malbatê netewefiroş e û bi hemû taybetmendiyan xwe tîpên neyînî ne. Bavên netewefiroş çawa ji neteweya xwe ra nedirust û xayîn in herweha bi hevjin û zarokên xwe ra jî li hev nakin. Çawa ku hezkirin û sêdaqeta wan bo welat û neteweya wan tune herweha hezkirin, rêzdarî, dilsozî û sêdaqeta wan bo hevjinê xwe jî nîne, girêdanekê tîkûz a hezkirin û baweriyê di nav wan û qîzên wan da nîne. Lêbelê beravajî bavên netewefiroş, hevjin û qîzên wan gelek neteweperwer û welatperwer in. Bi gotineke din digel zarokên bavên neteweperwer, yên netewefiroş jî tev neteweperwer in. Lewra berevajî bavî dayikên wan neteweperwer in, nîrx û hişmendiya neteweyî veguhezandine zarokên xwe.

4. Jina Kurd Wek Şervan û Berxwedêr: “Keça Neteweya Xwe”

Eliyê Evdilrehmanî, şervanî û berxwedêrî wek taybetmendiyeke jina kurd derxistiye pêş. Di vê peywendê da di berhemên nivîskarî da behsa qehremenî, berxwedêrî û herweha dilsozî, aqilmendiya jina kurd di şerên neteweyî da hatiye kirin. Di cîhana çîrokî ya *Şer Li Çîya* da nivîskarî li hember qehremenî û mîrxasiya mîrê kurd Şêx Zayîr, Simbil wek qîza kurd a qehreman, fedayî, berxwedêr bi cih kiriye. Di romanê da Simbil keça kurdfiroşekî ye, lê balkêş

e ku hîn di zarokatiya xwe da xwedî hest û ramanên neteweyî ye, canfedaya neteweya xwe ye. Ew û Şêx Zayîr di heman medreseya da dixwînin û li wir Şêx Zayîr ji ber taybetmendiya kurbûn û serfiraziyê bala wê dikişîne.

Nivîskarî di peywenda texeyula neteweyî, “tolhildana xwişk û birayê xwe”, berevanî û rizgariya welatî da hin taybetmendî, berpirsiyarî û rol dane ser keça kurd -Simbil- û ew îdealîze kiriye. Di vê çarçoveyê da dikare bê gotin nivîskarî bi giştî bi du sedeman karaktera Simbilê afirandiye: Yek bi piştgirî û helwesta jina kurd a kurdperwer zexmkirina hemaseta neteweyî û ya duyem birêkûpêkkirina serhildana Şêx Zayîrî. Ji vî alî ve Simbil hem ji bo hemaseta îdeolojîk û hem ji bo sêwirîna rêzebûyera romanê wek amrazêke fonksiyonel xuya dibe. Simbil di destpêkirina serhildana Şêx Zayîrî û serkeftina çalakiyên ewil da xwedî roleke diyar e. Ji ber hevalbendiya bavî bi waliyan û paşayên Romê ra Simbil hay ji plan û agahiyên veşartî yên dîwanê dibe û wan digihîne Şêx Zayîrî. Bi vî rengî planên dijmin betal dibin, Şêx Zayîr û desteya wî çalakiyên serketî pêk tînin. Simbil kirinên qirêj ên bavê xwe erê nake, ji bo betalkirin û pûçkirina polîtîkayên dîwanê û kiryarên bavî dixebite û alîkariyeke giring dide desteya Şêx Zayîrî. Bi vî awayî taybetmendiya berxwedêriyê digire ser xwe.

Simbil rojekê qirmeke mawzer diyariyî Şêx Zayîr, “lawê neteweya xwe” dike (r. 84). Di dûmahîka romanê da em dibînin ku serhildana Şêx Zayîr dest pê dike û ew ligel desteya xwe dikişe çiyayan. Hevalên wî dibînin ku Şêx Zayîr, “...qirma mawzera ku Simbilê pêşkêş dabû wî, ji xwe re kiribû edet, çeka xwe ji qibûrê derdixist, pê ra şa dibû, bîhn dikir û fena carina jî wexta razanê maç dikir” (r. 160-161). Bi vî rengî nivîskar evîna Simbil û Şêx Zayîrî derdixe pêş. Lêbelê evîna wan evîneke dualî nîne, evîneke sêgoşeyî ye. Li aliyekî evîna Simbil û Şêx Zayîrî, yanî evîna dinyewî; li aliyê din evîna wan a bo welêt, yanî evîna manewî mewzûbehs e. Di destpêkê da pêwendîya Şêx Zayîr û Simbilê bi evîna welêt dest pê dike, evîna dinyewî bi temamî li paş e. Lê dema ku rojekê reqîbek derdikeve navê ku bavê Simbilê dixwaze wê pê ra bizewicîne -ya rastî êdî di romanê da fonksiyona Simbilê ya gihandina sirên dewletê diqede- Simbil bi nameyekê ji Şêx Zayîrî dixwaze ku wê ji destê xayinan xelas bike. Hingê “[a]lava bengîtîyê” Şêx Zayîrî zevt dike û “mecbûr dibe kilîda sira xwe ya bengîtîyê ji xwe ra veke!” (r. 160). Evîna welêt, her du bengîyan digihîne hev û herî dawîn her du jî di oxira wê evînê da canê xwe didin. Evîna welêt û neteweyî ji bo wan evîna heqîqî ye, evîna dinyewî ya jin û mêrî di asta duyem da ye. Di evîna sêgoşeyî ya Simbil, Şêx Zayîrî û evîna wan a bo welêt da, ya serdest evîna welêt e. Evîna du karakteran ji bo diyarkirina berzahî û pîroziya evîna welêt, wek xaleke derbasîyê hatiye bikaranîn.

Di *Xatê Xanimê* da temsîla jina berxwedêr, di şexsiyeta Xatê Xanimê da bi zêdeyî hatiye bercestekirin ku temsîleke wê ya din -jina kurd a desthilatdar- xurt dike. Lêbelê di heman berhemê da afirandina Zeynê wek jineke berxwedêr gelek balkêş e. Lewre ewil Zeynê bi taybetmendiyên nerîtî û pederşahiye hatiye texeyulkirin. Ew bi tenê bi wesfên wek jina Sultan û bûka Xatê Xanimê di nava rêzebûyeran da xuya dibe. Tevger û taybetmendiyên wê li gor pîvan û taybetmendiyên nerîtî yên bûka kurd hatine çêkirin. Ew wek bûka malê kar û barên malê dike, xizmeta xesû, mêrê xwe û mêvanan dike û hwd. Ew heta derekê bi tamamî bêdeng e û di rengê figuranekê da ye. Bi tenê bi taybetmendiya jintî û bûktiyê, bi peywira xizmeta malê û hezkirina Sultanî car caran tê ber çavan (r. 30, 44, 48, 54). Piştî ku Xatê Xanim wê bo hawarê dişîne mala bavê wê, xeslet û karakterê Zeynê bi awayekî din tê pêş. Di rêzebûyer, teswîr û diyalogên li dor mala bavê da bi giştî bal hatiye kişandin ser edet û toreyên xirab ên berê yên wek qelend û bêqîmetiya qîz û jinan û ew ji perspektîfa Zeynê hatine rexnekirin. Herçiqaş Zeynê rexne bike jî ew dîsa li gor qalibên nerîtî yên civakî tevdigere. Mesela di hizûra bavê xwe da naaxive û yekser hawara xwe nagihîne wî. Bi amraza dayika xwe sedema hatina xwe digihîne bavî. Dema bav tê odeyê, “Zeynê ji şerma bavê xwe” ji odeyê derdikeve (r. 59). Herweha bav bi navbeynkariya Fatê Xanimê gotinên xwe digihîne keça xwe. Ji gotinên bavî, Zeynê fam dike bav derdê wê derman nake û di ser da bi fêlbazî li dû hesabên xirab e wekî piştî mirina Sultên bo qelend keça xwe bide yekî din. Li ser vê Zeynê bav û dêya xwe red dike. Ew herweha kirinên nebaş ên bavê xwe dinirxîne û digihîje wê qeneatê ku ew bi neteweya xwe ra xayîn e (r. 60-62). Lewra bi hêrs û qehr destvala vedigere mala xwe. Nivîskarî ji vir û şûn da Zeynê bi taybetmendî û tevgerên dijberî yên berê texeyul kiriye. Ev veguherîna radîkal a karakterê li ser zimanê wê wiha vegêraye: “Min hetanî roja îroyîn bûktî ji herkesî re dikir, çimkî Sultanê tayê tenê li malê bû. Roja îro ez jî di mala xwe de Sultan im. Ji şermkirinê tukes tiştêkî nade min.” (r. 62). Ew lê zêde dike: “Heta deqîqeya min a paşîn ez ê bona berdana Sultên tevî Kurdan şer bikim.” (r. 62). Ev biryar, tevgerên Zeynê diguherîne. Ew êdî ne bi tevgêrana bûktiyê, lê bi hêrs û bêşerm tevdigere, diçe “nava koma mêran” û “li cem Xatê Xanimê rûdine”. Hemû cimaet di tevgerên wê da şaş dibin. Xatê Xanim xwe zevt nake û bi bertek sedema guherîna wê dipirse. Bersiva Zeynê sedema guherîna xeslet û tevgerên wê eşkere dike: “Bibexşînin ku min şerm bi carekê ve avêt. Helbet, bi adetên bav û kalan ev yek ne lazimî jina Kurd e, lê rojên qalmeqalmên giran, ev yek lazim e û ferz e.” (r. 63). Wek sedema bingeîn jî fen û fêl, kirinên xirab ên bavê xwe destnîşan dike (r. 63). Piştî eşkerebûna sedema veguherîna tevgerên Zeynê, li ser zimanê Xatê Xanimê ew veguherîna radîkal tê erêkirin: “Jina Kurd di hemû qalan de darpiştê mêrê xwe ye. Lawo, bi dû van mêranîyên te re, tu jî yeka nola Sultên î.

Tu jî tevî cimaeta me bona şixulê Sultên şer bike, ka bê heta wê çaxê çi dibe.” (r. 64). Herçend Xatê Xanim bêyî şer Sultên bide berdan û karaktera Zeynê di bin siya karaktera Xatê Xanimê da be nivîskarî bi veguherîna radîkal û biryara şerkirinê ya Zeynê berxwedêrî û amadebûna bo şerî kiriye taybetmendiyeke bingehîn a jina kurd. Diyar e wek temsîla jina desthilatdar û pêşenga neteweyê, temsîla berxwedêriyê jî bi deyn li jina kurd hatiye danîn. Lewre wekî ji gotinên wê jî diyar e Zeynê encax di “rojên qalmeqalmên giran” da taybetmendiya berxwedêriyê dide ser xwe. Ev jî diyar dike ku temsîla jina kurd a berxwedêr, rol û fonksiyeneke alîkar û palpiştiyê heye. Herwekî din Zeynê di şûna mêrê xwe da rûdine û pê ra jî taybetmendiyan wî li xwe dike. Bûkîtiyê û şermê, yanî taybetmendiyan nerîtî yên jintiyê dide aliyekî û dibe wek mêran. Bi gotineke din ew ne bi taybetmendiyan jinan(e), bêtir bi yên ji mêran deynkirî dibe temsîlkara berxwedêriyê.

Ji xeynî berxwedêriyeke hisî û îradeyî, daxwaz û amadebûna jinê bo şerî di berhemên nivîskarî da karakterên jin ên şervan jî hatine sêwirîn. Temsîla jina kurd a şervan herî zêde di romana *Şer Li Çiya* da heye. Piştî çûyîna çiyê, Simbil jî tevî desteya Şêx Zayîrî dibe. Ji devê Şêx Zayîrî hatiye vegêran ku ji xeynî Simbilê di desteyê da gelek jinên din hene (r. 246). Lêbelê herçiqas behsa hebûna şervanên jin û lehengiyan wan hatibe kirin jî di şeran da çalakî û şervaniya wan berceste nebûye. Bi tenê ber bi dawîya şerî nivîskarî behsa desteya jinan kiriye û di şexsiyeta Simbilê da berxwedêrî û şervaniya jina kurd di nava rûdanan da aniye ber çavan. Di dawîya şerî da desteya Şêx Zayîrî têk diçe, desteya ku Simbilê lê efserî dikir jî neçar dibe li hinda zagekê -ku Şêx Zayîr jî tevî desteya xwe di hundirê wê da ye- qeleceyekî çêbike. Leşker êrişî qeleceyê dikin, lêbelê dixwazin Simbilê bi saxî derdest bikin. Lewma jî apê wê, Evdilmecîd wek navbeynkar dibêje Simbilê ku ew êdî şer neke, teslîm bibe û sozê dide ku dê tiştêkî pê nekin. Simbil bi xapê bi teslîmbûnê qayîl dibe, lê dema apê wê ber bi wê ve tê wî dikuje. Herweha ji bo ku nekeve destê dijmin guleya dawîn di serê xwe da diteqîne (r. 310-313). Dema Şêx Zayîr vê rûdanê dibîne ji aliyekî ve hêrs û xemgîn dibe, ji aliyê din ve ji bo ku “helala wî û qîzên hevalên wê dil neketine destê qetilkaran” (r. 313) şa dibe. Di prologa romanê da jî nivîskarî teslîmnebûn û bi fişenga dawîn xwekuştina jina kurd wek rawesteke giştî ya jina kurd vegêraye (r. 22). Bi vî rengî berxwedêrî wek taybetmendiyeke giştî ya jina kurd pêşkêş kiriye.

Di romana *Gundê Mêrxasan* da jî em rastî jina kurd a berxwedêr û şervan tên. Vegêr dema behsa şervanî û azadiheziya kurdan kiriye bi taybetî bal kişandiyê berxwedêrî û şervaniya jina kurd. Li gor vegêrî hemû dinya şahid e ku jina kurd di rojên xirab da bûye palpiştî neteweya xwe. Wê, “[t]iving hildaye, bi mêran re bi tevayî li çiyayan, li miqabilî dijmin şer kiriye.” (r. 51). Di romanê da di şerê Îran û kurdan da kurd hilkişiyane çiyayê Xezalê. Li wir tevî mêran

“jin û qîzan tiving hilda[ne]” (r. 52), sînorên xwe parastine. Berxwedêrî û şervaniya jina kurd bi giştî di karaktera Gogê da hatiye temsîlkirin. Gogê di şerî da Riza Efendî têk dibe ku xayîn û dijminê kurdan e û çav berdaye Gogê (r. 43-48).

Di *Gundê Mêrxasan* da nivîskarî bal kişandiye dijberiya jina kurd a berxwedêr û bavê xayîn. Di diyalogekê da jina kurd weha teswîr kiriye: “...jina Kurd li ber her tehlî û tengasiyên mêrê xwe sekiniye. Roja ku dibe ceng, ew mîna bira li pişta mêrê xwe disekine. Dikute, tê kutan. Dikuje, tê kuştin... Îro dota Kurd li pişta cimaeta xwe sekiniye, seba azayiyê û bextewariya paşwextiyê, heta li miqabilî bavê xwe şer dike.” (r. 193). Xuya ye teswîr û pesinandina jina kurd bi nasnameya wan (Seyari, 2020:108) hatiye kirin. Li aliyê din nelihevkirina îdeolojîk a bav û qîzê xaleke hevpar a berhemên nivîskarî ye (Sayım, 2020, r. 131). Nivîskarî bi dijberiya bavê xayîn û qîza welatparêz xwestiye bide zanîn netewe(tî) nirxa herî bilind e. Eger ji bo wê xizmetê nekin tîkiliyên malbata pedersahî dê bîn serûbinkirin. Ev rewşeke paradoksî ye ji ber ku tê îdîakirin jinên kurdperwer ji bo nirxên gelî şer dikin, lê li aliyê din ji nirxên gelî û rolên zayenda civakî -ku otoriteya bavî bê lêpirsîn û gumanê qebûl dike- tî dîrxistin (bnr. Yalçın-Heckmann ve van Gelder, 2016, r. 335).

Herçend nivîskarî jina kurd bi rengûrûyekî berxwedêr û şervan texeyul kiribe jî ew her tabîî mêr hiştiye. Ji vî alî ve texeyula nivîskarî bi rastiyan civakî û dîrokî ra li hev e. Lewre di bizav û dozên neteweyî yên kurdan da jin di asta duyemîn da ne, ew bi giştî bûne alîkar û palpişta mêran. Statûyeke wan a pêşengiyê nebûye (bnr. Mojab, 2013, r. 123-127). Texeyula jina kurd a berxwedêr û şervan di berhemên nivîskarî da ji rol û fonksiyoneke alîkar û palpiştiyê wêdetir neçûye. Di vê peywendê da di berhemên nivîskarî da -bi tesîra polîtîkayên sosyalîzmê jî- ji hin aliyan ve jin û mêr wekhev hatine texeyulkirin. Digel vê di rêzebûyer û rûdanan da jin her li paş e, pêşeng û aktorên esas mêr in. Wekî rastiya dîrokî û civakî berxwedêrî û şervaniyê, azadî û wekheviyeke mitleq bexşî jina kurd nekiriye.

5. Jina Kurd Wek Hilgira Çand û Namûsa Neteweyê/î: “Jina Kurd a Xas”

5.1. Jina Kurd wek hilgira çand û nerîte

Di civaka kurdan da girêdayî çanda nerîtî taybetmendî, tevger, karbeşî, erk û rolên cuda li jin û mêran hatine ferzkirin. Ev yeka zayenda civakî bi awayekî qatqatî diafirîne. Di nerît û jiyana kurdan da zayenda civakî tevî zayendên dijber di navbera hev-zayendê da jî mewzûbehs e. Li gor hin taybetmendiyên -zewac, zarokanîn, sal- erk û tevgerên cuda li jinê hatine barkirin. Di tîkiliya bûk û xesûyê da ev yeka bi eşkereyî tê dîtin. Bûk -bi taybetî yên nû- wek erkeke zayenda civakî li cem mêrên malê yên jê mezintir, tî û xezûrê xwe rûnane, xwarinê naxwe, naaxive, ji

zarokên xwe hez nake. Her di hundir da ye, bitenê dernakeve derve û ji hemû karên malê berpirsiyar e. Kontrolkirina bicihanîna erkên bûkê di bin berpirsiyariya xwesûyê da ye. Xesû heta asteke bilind ji erk û pêwîstiyên zayenda civakî azade dibe û bi rihetî dikare hem têkeve civata jinan û hem ya mêran. Ji vî alî ve jina gihîştibe statûya xesûbûnê, dibe wek miroveke navzayend. Ew di cimaeta mêran da rûdine, pûte bi fikr û gotinên wê tê kirin, tesîra wê li ser zewaca kurê(n) wê dibe û hwd. Eşkere ye di civak û çanda kurdan a nerîtî da qîz û bûk zêde di rol û erkên tepisandî û hişk ên zayendî da hatine asêkirin, dayiktî -bi taybetî dayiktiya lawan-heta derekê wan rol û erkan sist dike. Lêbelê bûkanîn, yanî statûya xwesûbûnê jinê ji rol û erkên tepisandî heta asteke bilind rizgar dike, lê îcar roleke din lê bar dike: Kontrolkirina bicihanîna rol û erkên zayendî ji aliyê jinên ciwan ve. Di vê çarçoveyê da têkiliya xesû û bûktiyê li ser hiyerarşiyekê ava dibe (bnr. Yalçın-Heckmann, 2012, r. 217-219; Çağlayan, 2017, r. 42; Suvağci, 2021, r. 765). Di *Xatê Xanimê* da têkiliya bûk û xesûyê dikare di bin ronahiya van agahiyan da bê nirxandin. Tevî ku nivîskarî xwestiye statûya jina kurd di asteke bilind û îdeal da, bi mêran ra wekhev destnîşan bike jî cih bi cih nekariye newekheviyên zayendî binuximîne. Di berhemê da bûka malê, Zeynê wek bermalekê ji karên malê û xizmeta xesû û mêrê xwe û mêvanan berpirsiyar e, di cimaetê da rûnane, naaxive. Lêbelê *Xatê Xanim* karaktereke gelek serdest e, pêşanga hemû cimaetê ye, gotin û biryara wê qeder û dahatûya hemû cimaetê diyar dike. Herweha serdestî kur û bûka xwe ye, li ser wan xwedî biryar û hikum e. Sultan derbarê rewşa xwe da bi Zeynê qet naşêwire, fikrê wê napirse. Lê wê wek bermalekê dişîne cem diya xwe, “[h]ere gazî diya min bike, bila bê, bê çi şêwr û rayê dide me” (r. 18). *Xatê Xanim* tê, jixwebawer temiyar li kurê xwe dike. Herweha *Xatê Xanim* wek hikumdar û qumandarekê di cimaetê da rûdine, cimaetê bi rê ve dibe. Dema mêvanên nû tên cimaetê ji bûka xwe, Zeynê daxwaz dike ku xizmeta wan bike (r. 30). Berçav e têkiliya xesû û bûkê li ser zemînekê hiyerarşîk e.

Di civaka kurdan da biedebbûn û biterbiyebûn wek tevgerê zayendî li ser jinan hatiye ferzkirin (Bayezîdî, 2010, r. 104). Herçiqas jinên elît, jinên salmezin -bi taybetî dayikên kuran- ji hin rol û erkên zayendî azade bin jî tevgerên biedeb wan mutebertir dike. Di *Şer Li Çiya* da Xezê Xanim, wek jineke rêzdar hatiye pênasekirin û hatiye diyarkirin ku ew bi taybetî beşdarî çareserkirina pirsgrêkên dijwar ên êl û eşîran dibe. Hatiye vegêran ku “Xezê Xanim cahil bû! Lê kirinên wê yên porspîyan bûn” (r. 36) û di dewamê da cixarekêşana wê bi berfirehî hatiye teswîrkirin. Ev teswîr, teswîrên seyyahên Rojavayî bi bîr dixwe ku jina kurd di îmajê gelek azad û serdest da destnîşan dikin. Lê hema piştî vê teswîrê Evdilrehman karakterê bi awayekî din teswîr dike. Xezê Xanima ku “şahî sekinîbûya, padişayî sekinîbûya, wê gotar dida” (r. 36)

îcar bi tevgerên zayendî xuya dibe: “Xezê tu wext li jorî mêvan û gelî de rûnedinişt. Ew her dem li jêrê û li aliyê çepê rûdinişt û wexta ku gilî dihate ser wê, dest bi bersîva xwe dikir” (r. 37). Biedebiya karakterê di romanê da ji aliyê cimaetê ve tê teqdîrkirin û dibêjin: “Şîrê vê jinikê bi rûmêtî û helalî ye” (r. 37). Ev mînak piştrast dike ku di gotara netewetiyê da jin tê berzûbalakirin, lêbelê di jiyana rojane da di têkiliyên pederşahiyê û erkên zayendî da tê asêkirin (Yalçın-Heckmann & van Gelder, 2016, r. 350). Bicihanîna rol û erkên zayendî, ji aliyê civakê ve bi kêfxweşî tê pêşwazîkirin.

Di rojên taybet da jî karbeşiyêke zayendî tê dîtin di nerîta kurdan da. Di şînên kurdan da jin guliyên xwe jêdikin, bêtir digirîn, reş girê didin (Bayezîdî, 2010, r. 50). Di şînan da li ser miriyan vegêrana zêmaran bêtir wek karê jinan tê zanîn. Jin li ser miriyan hestên xwe yên keser û şînê, derd û xemên xwe vedigêrin (Allison, 2013, r. 255). Lewma zêmar dikare wek cureyêke “folklorî jinan”; jinên reşgirêdayî, porkurî û bigirî di çanda kurdan da wek semboleke xemginiyê bîn binavkirin. Di berhemên Evdilrehmanî da jî ji bo têkçûyîn û şehîdên neteweyî girî û reşgirêdan wek erk û taybetmendiyêke jinan xuya dibe. Di *Gundê Mêrxasan* da di şerê Îranê û eşîrên kurdan da kurd têk diçin û gelek fedayiyên kurd dimirin. Teswîra şîna fedayiyên kurd bêtir bi tevgerên jinan hatiye kirin: “Jinan reş wergirtin, guliyên xwe jê kirin, sûretên xwe qelişandin...” (2012, r. 64).

Di berhemên nivîskarî da mêr bi xeslet û erkên jorîn nayên dîtin. Ev dikare bi feraseta patriyarkalîzmê bê şîrovekirin ku newekhevî û ducemseriya zayendî ava dike. Di patriyarkalîzmê da jin û mêr wek du zayendên dijber tînin însakirin. Mêr bi taybetmendiyên parêzger, hêzdar, çalak, têkoşer, cîhangîr; jin bi taybetmendiyên pasîf, bêhêz, neçalak, pêwîstî parastinê tê texeyulkirin (Yekdeş, 2008, r. 120). Herweha bêtir hestên navxweyî li jinê, mentiq û hestên derveyî li mêrî hatine dabeşkirin. Însakirin yan jî veînsakirina patriyarkalîzmê ya ferhengî û wateyî di zimanê kurdî da, deravêtiyêke vê dabeşkirinê ye. Di kurdî da bêjeya “jinê” wek tirsonek, qels, bêderman; beravajî wê bêjeya “mêrî” wek xîret, dilawêr, wêrekî tê pênasekirin. Cîhana jin û mêran wek du cîhanên dijber hatine saz kirin û nayê xwestin ku ew ji sînoren zayendî derkevin. Derketina yekî/ê ji sînoren zayendî bêje û wateyên nû yên patriyarkalî diafirîne: wek jinanî, jinreng, kiçanî, kuranî, dêlekuranî û hwd. (Hassanpour, 2013, r. 319-322). Di vê çarçoveyê da di berhemên nivîskarî da li jinê barkirina kar û barên şînê yên wek girî, reşgirêdan û vegêrana zêmaran divê wek encama hevyeckirina jinê bi hestên navxweyî û wateya qelsbûnê bê nirxandin. Nayê hevîkirin û xwestin ku mêrek bigirî, reş girê bide û li ser miriyan zêmaran vegêre. Lewra ev ne kar û barên mêran(e) ne û mêran ji sînoren zayenda wan derdixe û qels dide nîşandan.

Bi taybetî di *Gundê Mêrxasan* da nivîskarî, cil û bergên jinên kurd bi hûrgilî teswîr kirine û edetên dîlanên kurdan ên bêtir girêdayî jinan vegêrane. Di dîlanê da “[q]îz, bûk û jinan kincên awazawazî li xwe kiribûn, qolên zêran li ser kofî û eniyên xwe nitirandibûn” (r. 198). Bi vî rengî jin wek nîşaneyê ciyawaziyên neteweyî tê xuyakirin. Nivîskarî behsa birina pişt perdeyê ya bûkan, edetên xwarina dîlanê, stranên ji aliyê jin û qîzan ve li ser bûkan tîn gotin, xemginiya dê û bavê bûkê kiriye (r. 203). Herweha nivîskarî, edetên derbarê birina bûkê ya mala nû da veguhestine ku jin tê da hem bireser (bûk) e û hem jî beşdara sereke (xesû) ya bicihanîna wan edetan e (r. 206). Bi vî rengî nivîskarî, jin bi roldîtina navendî di edetên kurdan da wek hilgira çandî derxisteye pêş.

5.2. Jina Kurd wek hilgira namûsa neteweyê/î

Bi awayekî dubare em dikarin bibêjin xaleke hevpar a pederşahî û netewetiyê, texeyula malbatê û giringpêdayîna zayendîtiya jinê ye. Di pederşahiye da sermiyanê malbatê mêr e, jin û mêr li gor zayenda xwe tevdigerin, parastin û namûsa endamên jin peywira mêran e. Di netewetiyê da jî heman modela malbatê dibe temsîla neteweyê. Hem di pergala pederşahiye û hem di bizav û siyaseta netewetiyê da jin di bin tehekuma maskulen da ye, lêbelê jin tê berzûbalakirin jî. Ji ber vê giringiyeke zêde li ser zayendîti û namûsa wan tê dayîn. Temsîla welêt wek jinekê -dayik, bûk, keça xweşik- esasen bi analojiya netewe û malbatê ra û namûsa jinê ra têkildar e. Bi nêrîna mêrên nerîtparêz jin temsîlkarên namûsa malbatê û neteweyê ne û bi xwe jî parêzvanên malbatê û neteweyê ne. Di vê peywendê da namûsa jinê, bi gotineke rasttir destdirêjiya li jinê, hetîketiya mêr, malbat û neteweyê ye (Nagel, 2016, r. 84). Di berhemên Evdilrehmanî da jî welat wek jinekê hatiye texeyulkirin û destdirêjiya li jina kurd wek pîrsgirêka mêran hatiye dîtin. Di berhemên nivîskarî da yekcaran welat dayik e ku ji lawên xwe yên têkoşer ra bûye starek, di roja teng da ketine “paxila” wê (2011, r. 320) yan bûye hembêza dayikê: “...bi hezaran şoreşvanên mêr û jin bona azadbûn û serbestîya neteweya xwe şehîd ketine, heta hetayê di paşila Girîdaxa dayik de serê xwe danîne” (2011, r. 340). Yekcaran jî bi qasî bûkekê xweşik e, “...mîna bûka Kurdan a bi xêlî” (2004, r. 14) hatiye xemilandin û “...bi bedewiya tebîetê ve mîna bûkeke Kurdan a dêrewazî” (2012, r. 197) ye. Çawa ku di texeyula nivîskarî da cografyaya welêt hevşibê jinê ye, namûs, zayendîtiya jinê û destdirêjiya li jinê jî bûye meseleyeke neteweyî. Mesela di *Şer Li Çiya* da desteya Şêx Zayîrî bi alîkariya pasewanekî -Xosrov- dê girtiyekî kurdperwer -Elî- ji girtîgehê birevînin. Şêx Zayîr encamên mihtemel ên revandinê difikire ku dibe Xosrov jî bê derdestkirin û kuştin. Ew derbarê namûsa jinên malbatê yên dê bêmêr bimînin da difikire û li çareseriyên digere. Weha vedigêre ji dayikê ra: “...herdu keçên te cahil in, min bibexşînin. Tirk çi bixwazin wê bikin, dibe namûsa me re... Roja kifşkirî ez ê wisa bikim wekî

lawik bên we bibine cîhekî bê talûke ku namûsa me di cîyê xwe de be” (2011, r. 117). Berçav e çawa di civaka nerîtî da mêrê malbatê namûsa jinê diparêze, di peywenda neteweyê da namûsa jinê bûye namûsa neteweyî û meseleya têkoşerên lawîn. Di cîhekî din ê romanê da gundî agahiyan ji Şêx Zayîr ra dişînin ku leşker bi ser gundan da digirin, zilm û zordariyê dikin. Ji bo rastdêranê Şêx Zayîr desteyeke biçûk dişîne nava gundan. Li gundekî dengê hawar û gaziya jinekê tê canfedayîyan. Canfedayî dibînin ku sê cendirme hewil didin tecawizî keçikeke kurd bikin. Canfedayî xwe bi hawara keçikê re digihînin û tecawizkeran derdest dikin. Hingê keçika rizgarbûyî, “...ber bi xwînmijan diçe, tû dike rûyê wan, her yekî çend şermaqan lê dide û paşve tê cem canfidayîyan, wan maç dike” (r. 124). Rûdan, wêneyekî heveng di texeyula xwînerî/ê da çêdike ku di şerên neteweyî da pircaran tê dîtin. Dipeyîtine ku di şerên neteweyî da jin dibin qurbanên êrîşên cinsî. Di şerên neteweyî da têgiha namûsê dibe sedema şabûn û serbilindiya yê têkbirî û hetîketiya yê têkçûyî. Dijmin dixwaze serkeftin û serdestiya xwe di ser bedena jinê ra destnîşan bike. Lewra qirêjkirina namûsa jinê, tê wateya qirêjkirina netewe û welêt. Jidestçûyîna namûsa jinan rûreşî û hetîketiyeke mezin a neteweyî ye, pêwîst e tol bê hîlanîn (Saigol, 2016, r. 250-251). Di mînakê da keçik heta deqîqeya dawîn li ber xwe dide û şervanên kurd tên wê û namûsa wê rizgar dikin. Bi vî rengî namûsa netewe û welêt tê rizgarkirin, rê li ber rûreşî û hetîketiya neteweyî tê girtin. Bi rizgariya namûsê, hevsengiya têkbir-têkçûyî, şabûn-hetîketiyê beravajî dibe. Bi tûkîrin û şermaqên keçikê, hetîketî dibe para aliyê din.

6. Pesinandin yan Biçûkxistin: “Jina Kurd a Mêrxas”

Eliyê Evdilrehmanî di berhemên xwe da tîpolojîyeke îdeal a jina kurd çêkiriye û ew zêde pesinandiye. Lêbele gelek balkêş e di pesinandina karakterên jin de zimanekî zêde mêrane bi kar anîye. Ji aliyê qehremenî, tirsnezani û wêrekiyê ve jin hertim bi xeslet û tevgerên mêr(ane) teswîr kiriye (bnr. Ölmez, 2018, r. 57). Bo nimûne; serokeşîr ji bo qehremaniya wê Gogê ji eniyê maç dike û weha pîroz dike: “Eferim, mêrxasa min, dota Kurdan!” (2012, r. 47). Herweha nivîskar, daxwaza Simbilê bo beşdariya li desteyê ji devê Şêx Zayîr weha şîrove dike: “Lê wisa jina Kurd jî mêrxas e.” (2011, r. 160).

Herwekî din di civînên giregirên êlê da Xatê Xanim hestên xwe yên dayikiyê vedişêre. Lewre “wê dixwest mêrxasiya jina Kurd bide kifşê û di ber dilê wan de bihata” (2004, r. 26). Ji ber vê rawestê cimaet derbarê wê da weha difikire: “Welleh ev jinika, mêrxas e” (2004, r. 28). Herweha dema bi hewildanên wê Sultan tê berdandina cimaet bi yekdevî bi gotinên wek “[c]anim, jinik mêr e, ne jin e...” (2004, r. 75) pesnên Xatê Xanimê didin.

Mirov dikare teswîra qehremeniya jinê bi têgihên mêrane ji du aliyan ve binirxîne. Ya yekem: Hem di warê ferhengî û hem di warê wateyî da zimanê kurdî di însa û (ve)berhemanîna pederşahiye da amrazeke rewa ye. Bo nimûne, di kurdî da sifetên taybetmendî û tevgerên jin û mêran bi mîsogerî ji hev hatine veqetandin. Di ferhengên kurdî da bêjeya “mêr”î (zilam, piyaw), bi taybetmendiyan wêrekî, mêranî, mêrane, netirsî, dilawêrî, merd, nêr, qewîn ra hevyeke hatiye dîtin; bêjeya “jin”ê, ji gelek aliyan ve wek dijberî “mêr, zilam, piyaw” hatiye dîtin. Bêjeya “jin”ê, bi bêjeyên wek “zeîf, bêhal, bêzar, mê, tirsonek” hatiye ravekirin. Di kurdî da eger hewce bi îfadekirina wêrekî, xurtî, netirsî û qehremaniya jinê bê dîtin bi têgihên mêrane tê kirin (Hassanpour, 2013, r. 319-320). Herwekî di îfadeya “[c]aba heft mêra dide” da tê dîtin cengawerî û xurtbûna jinê bi ya mêran tê qiyaskirin û pênasekirin. Herweha jina jêhatî û wêrek, bi aîdiyeta mêrekî tê binavkirin wek “keçebav” (Alakom, 2013, r. 80). Ya duyem: Di texeyula nivîskarî da welat bi jinê ra hevyeke hatiye dîtin û ji hin aliyan ve jin bûye temsîlkara welêt. Di texeyuleke bi vî rengî da netewe ji mêran pêk tê û nasnameya neteweyî li ser yekîtî û palpiştiya mêran ava dibe. Netewe-dewlet, -di rewşa kurdan da nasnameya neteweyî- herçiqas li ser modeleke nû ya civakê saz bibe jî rolên nerîtî yên li jinan barkirî di şeweyên modern da didomîne. Qalibên tevgerên zayendê êdî di şûna dîn yan nerîtê da ji aliyê netewe-dewletan -di rewşa kurdan da bizavên neteweyî- ve tîr diyarkirin (Berktay, 2012, r. 154). Di berhemên nivîskarî da gelek caran ev texeyula zayendparêz tê berçavkirin. Nivîskarî di vegêrana şer û serhildanên neteweyî da zimanekî gelek maskülen bi kar aniye û taybetmendiyan mêran(e) li neteweyê bar kiriye. Wî gelek caran ligel bêjeya “netewe”yê û “kurd” navdêr û hevalnava “mêrxas” bi kar aniye. Em geh dibînin “...Kurd fena mêran ber wê doza xwe dikin. Bi vê yekê ve navê mêrxasiya neteweya me wê li dunê belav be” (2011, r. 212), geh dibînin hinekan “...navê ‘Tirkên çiya’ daniye ser wê neteweya mêrxas” (2011, r. 340-341), geh dibînin pêşengên kurdan berî mirinê dixwazin cara dawîn “... çiya, mêşe, gelî û qeleçên Kurdên mêrxas” (2004, r. 16) bibînin, geh jî dibînin ku endamên neteweyên din bi gotinên “[w]eleh Kurd zor in, hundirê wan pola ye. Eferim ji we miletê mêrxas re!” (2012, r. 91) pesnên kurdan didin. Di vê rewşê da ku netewe bi mêrxasiyê hatiye pênasekirin, eşkere ye jin û xesletên jinan(e) ji netewe(tî)yê hatine vederkirin. Ev yeka taybetmendiyeke hevpar a netewetî û pederşahiye ye. Lewre di civakên pederşahiye da jî jin û xesletên jinan(e) biçûk tîr dîtin, qeder û berdewamiya malbat û civakê girêdayî endamên mêr tê qebûlkirin. Di *Şer Li Çiya* da Edoyê kurdîroş ji aqilmendî û jêhatîbûna keça xwe, Simbilê gelek dilşa ye, lêbelê zayenda wê ne bi dilê wî ye. Lewre weha vedigêre: “De bila heft mîrên mirazan re tu kur bûyayî. Te dê dewsa min bigirta û di cîhanê de derdê min ê qet tunebûna, lê...” (2011, r. 145). Berçav e di civaka

pedersahiyê da jinek çiqas bi taybetmendiyên erênî hatibe dorpêçkirin jî zayenda wê wek kêmasiyekê tê dîtin.

Di berhemên nivîskarî da jin bi tevgerên xwe jî wek mêran in. Wek mînak, di *Xatê Xanimê* da “Xatê Xanim bi mêranî” (r. 27) disekine, “[d]ergê qaymeqamtiyê bi mêranî” (r. 74) dikute; Zeynê “bi forma mêran” (r. 62) li hespê xwe siwar dibe û “bi forma mêrê mewetê li derê malê peya” (r. 63) dibe. Di *Gundê Mêrxasan* da “Gogê bi mêranî” (r. 105) dikeve hundir, Xezal “bi mêranî tevî wî şerî dibe” (r. 181), jina kurd di şeran da “mîna bira li piştta mêrê xwe disekine” (r. 193). Di *Şer Li Çîya* da dema Şêx Zayîr evîna xwe ji Simbilê ra eyan dike û bi evîndarî lê mezê dike “Simbil jî mêr kîmî li wî dinêhêre” (r. 95), Zozan “mîna mêran tilîya xwe bi ser” (r. 131) efser da dihejîne, diya Simbilê “bi hers û mêranî” (r. 146) diaxive, Fatma “mîna jina Kurd a mêrxas” (r. 245) şikurbûna xwe tîne. Balkêş e tevî ku *Şer Li Çîya* berhema herî qerase ya nivîskarî ye û wî lehengeke sereke ya jin, Simbil, afirandiye jî bi qasî berhemên din ên nivîskarî em jinan ewçend bi tevgerên mêran(e) nabînin. Ev, dikare girêdayî mêrxasî û lehengiya Şêx Zayîrî bê şîrovekirin. Lewre ew serlehengê romanê ye û taybetmendiyên erênî bêtir di şexsiyeta wî da hatine civandin. Jixwe di berhemên nivîskarî da lehengî û mêrxasiya jina kurd zêdetir di nebûna mêran yan hebûna mêrên jirêzê da tê ber çavan. Lewre di hebûna mêrekî wek Şêx Zayîr da nivîskarî, Simbil -tevî ew kiribe şervan û berxwedêr- bi giştî bi taybetmendiyên zayenda wê afirandiye.

Mîrov dikare teswîrkirina jinê bi xeslet, taybetmendî û tevgerên mêran(e), bi nêrîneke sethî wek şikandina sînoren zayenda civakî binirxîne. Lêbelê dema li teswîrkirina mêrî bi xeslet, taybetmendî û tevgerên jin(ane) û wateyên lêbarkirî binêre dê bibîne ku ne weha ye. Lewre vegêrana mêrî bi reng û awayên jinan(e) ji bo biçûkxistinê hatiye kirin. Nivîskarî, mêrên netewefiroş, xayîn bi rengûrûyên jinan(e) teswîr kirine û bêxîretiya mêran di şerê neteweyî da bi sifetên têkildarî jinê rexne kirine. Mesela dema Şêx Zayîr tevî desteya xwe bi ser mala Edo da digirin wî nabînin. Lewre Edo kincên jinan li xwe kirine û weha reviyaye (2011, r. 135). Teswîreke hevşib di *Gundê Mêrxasan* da jî heye. Di şerî da fedayîyên kurd leşkerên Îranê têk dibin. Destpêkerê şerî Riza Efendî jî ji bo ku nekeve destê şervanên kurd, kincên jinan li xwe dike û hewl dide bireve (2012, r. 43-47). Rewşa Riza Efendî bi rewş û tevgerên jinan(e) hatiye teswîrkirin: “Reng lê çilmisî, kelogirî bû, bi forma jineke delkbaz hêsir bi ser sûretê xwe da barandin...” (2012, r. 26). Li aliyê din di şerê neteweyî da kêmasî û bêxîretiya mêran bi girêdana jinan hatiye rexnekirin. Bo nimûne, Şêx Zayîr li gundekî ji ber nebûna nobederan û neamadebûna gundiyan bo parastinê mêrên gundî bi van gotinan rexne dike: “Filankes, ji zilma xwînxwaran dayîk û dotên Kurd dergûşên xwe ji milê xwe davêjin, sîlehan hiltînin û miqabilî

dijminî şer dikin ku neteweya wan nekeve bin destan. Lê hûn axirî di paşila jinên xwe de razane” (2011, r. 169).

Berçav e li jinê barkirina taybetmendî û tevgerên mêran(e) di wateyên erênî da, lêbelê li mêrî barkirina taybetmendî û tevgerên jinan(e) di wateyên neyînî da hatiye kirin. Bi gotineke din jin bi teswîrên mêran(e) hatine pesinandin, mêr bi teswîrên jinan(e) hatine biçûkxistin. Bûna wek mêrî ji bo jinê nîşaneyê serbilindî, jêhatîbûn, aqilmendî, tirsnezanî, qehremanî, pesinandinê; bûna wek jinê ji bo mêrî nîşaneyê hetîketî, biçûkdîtin, tirs, zeîftî, xayîntî, bêrûmetiyê ye. Loma li jinê barkirina xeslet û taybetmendiyan mêran(e) û dûrxistina ji zayendê, nikare wek şikandina sînorên hişk ên zayenda civakî bê nirxandin. Bileks dikare bê gotin ku sînorên heyî yên zayenda civakî bêtir zexm dike.

ENCAM

Netewe(tî) bi giştî li ser bingeha hest, fikr û tecrubeyên mêran hatiye înşakirin, lêbelê di înşakirin, bihêzkirin û berdewamiya wê da beşdariya jinê –çi simbolîk çi aktîf- gelek giringiya xwe heye. Di peywenda hezkirin û parastinê da bi awayekî metaforîk hevyeckirina welêt bi jinê ra, hişmendiya neteweyî ji aliyê hisî ve zexm dike. Jin bi taybetmendiyan xwe dibe nîşaneyê cîyawaziyên neteweyê, bi rêya zarokanî endaman –têkoşer, leşker û karker- li neteweyê zêde dike û berdewamiya neteweyê dabîn dike. Wek veguhêzer û fêrkerekê zarokên neteweyê bi ziman, çand û nirxên neteweyê/î perwerde dike. Herweha jin yekser beşdarî têkoşîn û şerên neteweyî û leşkerî dibe, di bizavên polîtîk û rêveberiya netewe-dewletê da bi cih dibe. Ji vê jin bi taybetî bala gotar û bizavên netewe(tî)yê dikişîne û di navenda texeyulên netewe(tî)yê da tê bicihkirin. Edebiyat jî bi vegêrana dîrok, şer û pevçûnên neteweyî; afirandina karakterên neteweyî, xayîn û dijmin dibe amrazek bo çêkirin, belavkirin û bihêzkirina texeyula neteweyî. Ne bi tenê netewe(tî) edebiyat, ji bo îdeolojiyên dîtir jî bûye/dibe amrazek. Heta amrazkirina edebiyatê bo îdeolojiyekê yekcaran dibe politikaya fermî ya dewletan. Rêbaza realîzma sosyalîst mîna herî berçav e ku ji aliyê endamên partiya sosyalîst ve hatibû teorîzekirin û li nivîskarên Yekîtiya Sovyetê hatibû ferzkirin ku pê propagandaya sosyalîzmê bikin. Wek nivîskarekî kurd ê Sovyetê Eliyê Evdilrehman jî berhemên xwe bi rêbazên realîzma sosyalîst nivîsandine. Tevî vê Evdilrehmanî di berhemên xwe da rûdanên dîrokî, şer, pevçûn û serhildanên kurdan ên neteweyî vegêrane. Berhemên xwe bi gotareke neteweyî nivîsandine, bi ajîtasyon û propagandaya neteweyî xwestiye hest û hişmendiyeke neteweyî di xwîneran da çêbike. Lewma dikare bê gotin nivîskarî herçend di berhemên xwe da berevaniya nirxên sosyalîst kiribe jî bêtir ew kirine amraza çêkirina nasmameya neteweyî, bihêzkirin û belavkirina fikr û hestên neteweyî. Netewetiya di berhemên nivîskarî da hatiye derpêşkirin carcaran di

rûyekî gelek tûj û tundraw da tê berçavkirin, lêbelê bi propagandaya nîrxên sosyalîst, gotara biratiya gelan nivîskarî hewil daye hevsengiyekê çêbike. Ji ber vê netewetiya di berhemên nivîskarî hatiye texeyulkirin, di rengê netewetiyeke çepgir da ye.

Di vê xebatê da li dor girêdana zayend û netewe(tî)yê hate vekolan ka di berhemên Eliyê Evdilrehmanî jina kurd çawa hatiye texeyulkirin. Nivîskarî di texeyula netewe(tî)yê da jina kurd bi hin rol û peywiran bi cih kiriye. Bicihkirina karakterên jin di berhemên Evdilrehmanî da qismen dikare wek deravêtiyeke polîtîkayên Yekîtiya Sovyetê yê derbarê mafên jinê da bê nîrxandin. Herweha di berhemên edebî da bicihkirina karakterên jin bi taybetmendiyan azad, jêhatî, jîr, wekheva mêr yek ji pêwîstiyên realîzma sosyalîst bû. Tevî vê nivîskarî karakterên jin bi giştî bi tîpolojîyeke neteweyî derxistine pêş, kirpandin li ser taybetmendiyan neteweyî, neteweperwerî û welatperweriya jina kurd daniye, rola wê di şerên neteweyî da berçav kiriye, girêdanên metaforîk di navbera jina kurd û welêt da çêkirine.

Di berhemên Evdilrehmanî da li dor girêdana zayend û netewe(tî)yê jina kurd bi giştî wek “dayika neteweyê”, “dayika zarokan” -yên neteweyê-, “piştewan û rêhevala mêrî”, “keça neteweya xwe”, “jina kurd a xas” hatiye texeyulkirin. Li ser vê texeyula neteweyî jina kurd bi rol, taybetmendî û berpirsiyarên wek desthilatdar, pêşenga neteweyê, hilgira biyolojîk, aqilmend, pêşbîn, neteweperwer, şewirmend, şervan, berxwedêr, hilgira çand û namûsa neteweyê hatiye karakterîzekirin. Nivîskarî di vê texeyul û karakterîzekirinê da bi giştî bi taybetmendiyan wek azad, xurt, jîr, jêhatî, cengawer jina kurd îdealîze kiriye û bi girêdana nasnameya neteweyî ew zêde pesinandiye. Lêbelê nivîskarî bi zimanekî zayendparêz, barkirina hest û tevgerên mêran(e) li karakterên jin pesn û payê jina kurd daye. Loma berzûbalakirina jina kurd di berhemên nivîskarî da bi awayekî îronîk û paradoksî bûye sedema veberhemanîna pederşahiye.

ÇAVKANÎ

- Alakom, R. (2013). *Di folklor kurdî de serdestiyeke jinan*. Avesta.
- Allison, C. (2013). *Folklor ve fantezi: Kürt sözlü geleneğinde kadınların sunumu*. Di nav S. Mojab (Ed.). *Devletsiz ulusun kadınları- Kürt kadını üzerine bazı araştırmalar* (245-263). Avesta.
- Bayezîdî, M. M. (2010). *Adat û rusûmatnameê ekradiye*. Nûbihar.
- Berktaş, F. (2012). *Tarihin cinsiyeti*. Metis.
- Çağlayan, H. (2017). *Analar, yoldaşlar, tanrıçalar*. İletişim.
- Ebdilrehman, E. (2004). *Xatê xanim*. Belkî.
- Enloe, C. (2003). *Muzlar, plajlar ve askeri üsler- feminist bakış açısından uluslararası siyaset*. Çitlembik.
- Ergün, Z. (2023). *Edebîyata kurdî ya Sovyetê*. Nûbihar.
- Evdilrehman, E. (2011). *Şer li çîya-şêx Zayîr*. Pêrî.
- Evdilrehman, E. (2012). *Gundê mêrxasan*. Lîs.
- Hassanpour, A. (2013). *Kürt dilinde ataerkilliğin (yeniden) üretilmesi*. Di nav S. Mojab (Ed.). *Devletsiz ulusun kadınları- Kürt kadını üzerine bazı araştırmalar* (307-356). Avesta.
- Kandiyoti, D. (2013). *Cariyeler, bacılar, yoldaşlar – kimlikler ve toplumsal dönüşümler*. Metis.
- Millett, K. (2011). *Cinsel politika*. Payel.
- Mojab, S. (2013). *1946 Kürt Cumhuriyeti'nde kadınlar ve milliyetçilik*. Di nav S. Mojab (Ed.). *Devletsiz ulusun kadınları- Kürt kadını üzerine bazı araştırmalar* (101-128). Avesta.
- Nagel, J. (2016). *Erkeklik ve milliyetçilik: ulusun inşasında toplumsal cinsiyet ve cinsellik*. Di nav A. G. Altınay (Der.). *Vatan millet kadınlar* (65-101). İletişim.
- Najmabadi, A. (2016). *Sevgili ve ana olarak erotik vatan: sevmek, sahiplenmek, korumak*. Di nav A. G. Altınay (Der.). *Vatan millet kadınlar* (129-165). İletişim.
- Ölmez, C. (2018). *Temsil di romanên dîrokî yên Eliyê Evdilrehman de*. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 3/2, 43-63.
- Saigol, R. (2016). *Militarizasyon, ulus ve toplumsal cinsiyet: şiddetli çatışma alanları olarak kadın bedenleri*. Di nav A. G. Altınay (Der.). *Vatan millet kadınlar* (227-259). İletişim.
- Sayım, İ. (2020). *Zordariya feodalîzmê û rizgarkeriya şoreşa Bolşevîk di romanên Eliyê Evdilrehman de*. Di nav M. Z. Ertekin- M. Yıldırımçakar (Ed.). *Destpêka romana kurdî – gotarên li ser romana êwra Kavkazê* (117-134). Peywend.
- Seyari, A. (2020). *Hewla avakirina bêjara neteweperwer di romanên Eliyê Evdilrehman de*. Di nav M. Z. Ertekin- M. Yıldırımçakar (Ed.). *Destpêka romana kurdî – gotarên li ser romana êwra Kavkazê* (99-116). Peywend.
- Suvağci, İ. (2021). *Zayenda civakî di lorîyên kurdî da*. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 9(3), 763-770.

- Uygur, E. (2005). Sosyalist realizm kavramının ortaya çıkış süreci. *Türkiye Sosyal Araştırmalar Dergisi- Turkish Journal of Social Research*, 9/1-2, 1-9.
- van Bruinessen, M. (2013). *Adile Hanım'dan Leyla Zana'ya: Kürt tarihinde siyasi liderler olarak kadınlar*. Di nav S. Mojab (Ed.). *Devletsiz ulusun kadınları- Kürt kadını üzerine bazı araştırmalar* (131-153). Avesta.
- Walby, S. (2016). *Kadınlık ve ulus*. Di nav A. G. Altınay (Der.). *Vatan millet kadınlar* (35-63). İletişim.
- Yalçın-Heckmann L. (2012). *Kürtlerde aşiret ve akrabalık ilişkileri*. İletişim.
- Yalçın-Heckmann, L. & van Gelder, P. (2016). *'90'larda Türkiye'de siyasal söylemin dönüşümü çerçevesinde Kürt kadınlarının imajı: bazı eleştirel değerlendirmeler*. Di nav A. G. Altınay (Der.). *Vatan millet kadınlar* (325-355). İletişim.
- Yekdeğ, Ö. F. (2008). *Nâzım Hikmet ve Cegerxwîn'de aşk şiirinin ideolojisi*. (YÖK Tez Merkezi, Yüksek Lisans). Bilkent Üniversitesi.
- Yuval-Davis, N. and Anthias, F. (1989). *Woman-nation-state*. Macmillan.